Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 512 24-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Naxwazin bihara bê jî zozananên wan qedexe bin



**Dewleta Tirk bi salane li Bakurê Kurdistanê şerekî qirêj li dijî gelê Kurd dike. Bi hênceta şer her carê zozanên Kurdan li wan qedexe dike. Li Geverê gundiyên debara xwe bi sewalvaniyê dikin, ji ber qedexekirina zozanan bi zor û zehmetiyê re rû bi rû dimînin. Gundiyan gotin ew êdî naxwazin bihara bê jî zozan li wan bên qedexekirin.**

Li Geverê gundiyên debara xwe bi sewalvaniyê dikin, ji ber qedexekirina zozanan bi zor û zehmetiyê re rû bi rû dimînin. Gundiyan, bilêv kir ku ev rewş zivistanê jî dewam dike û naxwazin bihara bê zozanên wan qedexekirî bin.

Li Colemêrg û navçeyên wê yên bakurê Kurdistanê nêzî sê sal in zozan hatine qedexekirin û ev qedexe zivistanan jî didome. Şêniyên gundê Serdeştê yê navçeya Geverê, diyar kirin ku tenê ew bi sewalvaniyê debara xwe dikin û ji ber qedexekirina zozanan ew ji mecbûrî êm, giya û kayê dikirin. Gundiyan, bilêv kir ku ji ber qedexekirina zozanan wan ji bo 3 mehan bi 25 hezar lîreyî zozan kirê kiriye û zivistanê jî giyayê wan bi lîre û nîvê dikirî niha bûye 5 lîre.

Şêniyê gund Abdûllah Karahan, destnîşan kir ku zivistana herêma wan hişk e û dirêj dajo û got: "Li navçeyê 3 sal in zozan hatine qedexekirin. Ji ber vê em hew dikarin sewalvaniyê bikin. 3 bihar in em nikarin biçin zozanên xwe. Dibêjin bi hinceta ewlehiyê zozan hatine qedexekirin, lê belê zivistanê jî ev qedexe didome. Zivistanê ewlehiya çi digirin nizanim. Ji ber qedexekirina zozanan di bihar û havînan de heywanên me baş nayên xweyîkirin. Ji ber zivistan 5 mehan didome em mecbûr dimînin êm, giya û kayê bikirin. Berê me ka bi 300 qurîşî dikirî, niha bûye lîre û nîv." Karahan, diyar kir ku 3 sal in ji ber qedexekirina zozanan mesrefê wan zêde diçe û xwest êdî dawî li vê qedexeyê bê.





### BALYEYA GIYA JI 1.5 LÎREYÎ BÛ 5 LÎRE

Sabrî Alaca jî, diyar kir ku demeke dirêj e li navçeya wan zozan hatine qedexekirin û ji ber vê ew mecbûrî bi fiyetekî biha zozanan kirê dikin. Alaca, destnîşan kir ku sê sal in ew di sewalvaniyê de dixisirin. Alaca, diyar kir ku armanca van pêkanînan qedandina sewalvaniyê ye, lê belê çi dibe bila biba ew ê sewalvaniyê bikin.

Mihyedîn Karahan jî, diyar kir ku berê wan hiriya heywanan dida dikandarên li navçeyê û beramberî wê ji xwe re erzaq dikirîn. Karahan got: "Lê belê niha kes hiriyê nakire. Ji ber vê jî em hiriya diqusînin dişewitînin. Ji ber kirêya zozanan, heqê şivanan, heqê êm û qedexekirina zozanan êdî hindik maye em top bavêjin. Berê li gund nêzî 15 hezar pez hebûn, niha 2 hezar heb hene. Berê balyeya giya 1.5 lîre bû niha bûye 5 lîre, ka bi 300 qurîşî bû niha bûye 1.5 lîre, kîloya êm bi 600 qurîşî bû, niha bûye 1.40 lîre."

Karahan, diyar kir ku ew tenê debara xwe bi sewalvaniyê dikin, lê belê çi dibe bila bibe dîsa jî ew ê dev ji sewalvaniyê bernedin. Karahan, xwest dawî li qedexekirina zozanan bê...*MA*

# Em ê projeya neteweya demokratîk biparêzin





Di merasîma vekirina firina bajarokê Ceza de welatiyan diyar kir ku ew di qonaxeke girîng re derbas dibin û ev qonax, qonaxa avakirin û sazkirinê ye û wiha gotin: "Tevî hemû gef û êrîşên faşîst em ê projeya neteweya demoratîk û hemû destkeftiyan biparêzin."

Komîteya Firinan li bajarokê Cezaa firineke nan vekir. Tê payîn ku ev firin pêdiviya nan ya 52 gundan bi cih bîne.

Avakirina firinê ku salekê dewam kir, di 22'yê Kanûnê de bi beşdarbûna bi dehan şêniyên bajêr û hevserokên herêma Qamişlo Nûr El-Eylan û Selman Şêxî û Endamên Komîteya Firinan a kantona Qamişlo bi merasîmekê hate vekirin.

Hevserokê herêma Qamişlo Selman Şêxî di merasîma vekirinê de axivî û diyar kir ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di dema serweriya komên çete de rastî talanê hatin. Şêxî di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku piştî rizgarkirina herêmê, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bi hemû derfetên xwe xwestekên welatiyên herêmên rizgarkirî yên Ceza û gundewarên wê peyde kirin.

Rêveberê firinê Muhened Şehlan El-Husên jî diyar kir ew îro di pêvajoyeke hesas re derbas dibin û ew jî merheleya avakirinê ye. Tevî ku gef û êrîşan jî wê projeya xwe ya neteweya demokratîk bidomînin.


Şêniyên bajêr kêfxweşiya xwe bi vekirina yekemîn firinê anîn ziman û spasiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk kirin...
*ANHA*




Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 512 24-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 90 çeteyên DAÎŞ'ê hatin kuştin, hezar sivîl hatin rizgarkirin

Di çarçoveya Qanoxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê de di navber şervanên QSD'ê û çeteyên DAIŞ'ê de şerên giran rû didin. Li Şefaa, El Sûsê û li eniya rojhilat a Hecînê çeteyên DAÎŞ'ê êrîş birin ser çeperên şervanên QS'ê û ji ber êrîşê şerekî dijwar qewimî. Di encama şer de herî kêm 90 çete hatin kuştin û zêdeyî hezar sivîl jî hatin rizgarkirin.*R-2*



# LI DIJÎ TECRÎDÊ ÇALAKÎ WÊ DEWAM BIKIN



Çalakiyên grevên birçîbûnê yên li Bakurê Sûriyê yên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku bi pêşengiya Kongra Star û PYD'ê ev demeke hatiye despêkirin dewam dikin. Hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê tevlî van çalakiyan dibin. Kesên ku beşdarî çalakiyan dibin dibêjin Ocalan rêberê hemû gelan e û ewê ji bo azadiya wî têkoşîna xwe bidomînin.

Li bajarê Hesekê jî bi pêşengiya PYD'ê û Kongra Star ji bo piştgiriya çalakiya Parlementera HDP'ê Leyla guven bi beşdariya 250 kesî çalakiya greva birçîbûnê hat despêkirin. Li ser armanca çalakiyê axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku ewê heta azadiya Rêber Ocalan çalakiyên xwe berdewam bikin. Çalakî wê du rojan dewam bike. *R-2*

## Xwe ji bo qonaxeke nû amade bikin



Komuna Enternasyonalîst a Rojava bi daxuyaniyekê ragihand ku dewleta Tirk a faşîst û hevalbendên wê gefa êrîşeke nû li gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyê dixwin û diyar kir ku wê bi gel re li ber êrîşên faşîst rabin û bang li her kesî kir ku xwe ji bo berxwedan û qonaxeke nû ya têkoşînê amade bikin. *R-5*

## Jinên Tebqayê li dijî gefên dagirkirinê meşiyan



Rêveberiya Jinan a Tebqayê bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk a dagirker li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, meşek li dar xist. bi sedan jin tevlî meşa ku ji gundê El Henadiyê despêkir û heta Tepqayê dewam kir, bûn. Di meşê de pankartên "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re" hatin hildan. Hat diyar kirin ku wê jinên Sûriyê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk berxwedana xwe mezin bikin. *R-2*

## Welatiyên Til Temirê tev li çalakiya mertalên zindî bûn




Çalakiya mertalê zindî ya ku li ser sînorê Serêkaniyê li dijî gef û êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk hatiye destpêkirin berdewam dike. Bi dehan welatiyên navçeya Til Temirê jî beşdarî çalakiyê bûn. welatiyên ku beşdarî çalakiyê bûn diyar kirin ku ew ê heta dawiyê li dijî êrîşan li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin. *R-2*

## Welatiyên Çilaxa li dijî gefên dagirkeriyê meşiyan




Meş û çalakiyên li dijî gef û êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser Bakurê Sûriyê bê navber dewam dikin. Bi vê armancê bi sedan welatiyên bajarokê Çilaxa yê girêdayî Qamişlo daketin qadan û meşek lidarxistin. Meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku bang li hemû gelên Sûriyê hat kirin ku li dijî êrîşan yekîtiya xwe ava bikin. *R-2*

## 22 endamên Kongreyê nameyek ji Trump re şandin



22 endamên Kongreya Amerîkayê derbarê biryara vekişîna leşkerên Emerîkayê ji Sûriyê de nameyek ji serokê Amerîkayê Donald Trump re şandin. Di nameyê de hat gotin ku vekişîna Emerîkayê ji Sûriyê wê zerarê bide berjewendiyên wan li herêmê. Her wiha hat gotin ku bi vekişînê re wê zerar li Kurdan û QSD'ê were. *R-5*

R-4 Namzetî û pêşbaziyê demokratîk — Tayîp TEMEL
R-5 Pirsgirêka Kurd a DYA'yê — Burhan ERDEM
R-7 Hêza Laşkerî ya DYA li Suriyê — Derwêş M. FERHO

## Em ê li dijî êrîşan destkeftiyên xwe biparêzin



Şêxên êlên bajarê Reqayê civînek lidarxistin û êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî Bakurê Sûriyê şermezar kirin. Şêxên eşîrên Reqayê diyar kirin ku ew êrîşên li ser xaka xwe qebûl nakin û dan zanîn ku wê zarokên wan li dijî êrîşan li ber xwe bidin û destketiyên xwe biparêzin. Şêxên Ereb destnîşan kirin ku ew bi QSD'ê re ne. *R-4*

## Emê li dijî êrîşên Tirkiyê li ber xwe bidin



Hevserokê Meclisa Sivîl a Reqayê Mişleb El-Derwîş diyar kir ku dewleta Tirk bi gef û êrîşan dixwaze aramî û yekîtiya li Bakurê Sûriyê têk bibe û wiha got, "Em hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê em ê li kêleka QSD'ê bisekinin û axa xwe ji êrîşan biparêzin." *R-4*

## Asûr/Sûryan divê li dijî qirkeran rawestin



Partiya Azadiyan a Mezopotmayayê (MOP) li dijî gefên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûiriyê helwest nîşan da û bang li gelên Asûr/Sûryan/Keldan kir ku li dijî hişmendiya qirker a dewleta Tirk helwesta xwe diyar bikin. Her wiha MOP'ê bang li raya giştî ya cîhanê jî kir ku li dijî tecrîdê li ber faşîzma dewleta Tirk bêdeng nemîne. *R-4*

## Bê statu hiştina kurdan êdî zehmet e



Seroka Giştî ya Partiya Kedê (EMEP) ya li Tirkiyê Selma Gurkan kir ku biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyê ne nû ye û da zanîn ku ji lihevkirina di hevdîtina Helsînkî ya di navbera serokê DYA'yê Trump û serok Rûsyayê Putîn pêk hatiye, serbixwe nîne. Selma Gurkan got: "Di roja îro de bê statu hiştina kurdan êdî zehmet bûye." *R-4*

# Heta azadiya Ocalan tekoşîn wê bidome

**Çalakiyên grevên birçîbûnê yên li Bakurê Sûriyê yên li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan dewam dikin. Li bajarê Hesekê bi pêşengiya PYD'ê û Kongra Star ji bo piştgiriya çalakiya Parlementera HDP'ê Leyla guven bi beşdariya 250 kesî çalakiya greva birçîbûnê hat despêkirin. Li ser armanca çalakiyê axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku ewê heta azadiya Ocalan çalakiyên xwe berdewam bikin.**



Pêkhateyên bajarê Hesekê di bin konê çalakiya greva birçîbûnê de kom bûn û diyar kirin ku wê di rêya xwe ya têkoşînê de dewam bikin.
Kongreya Star û PYD`ê konê çalakiya greva birçîbûnê ji bo tecrîda girankirî li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya Leyla Guven ku zêdeyî mehek û nîve di greva birçîbûnê de ye, li taxa Mişêrfê ya bajarê Hesekê vedan. 250 kes ji hemû pêkhateyên bajarê Hesekê û endamên saziyên wê, beşdarî çalakiyê bûne.
Endama rêveberiya Kongreya Star a kantona Hesekê Şêrîn Oso li bin kon axivî wiha got: "Em xwe radestî dagirkeriya Tirk nakin, em ê çalakiya xwe dewam bikin heta ku daxwazên Leyla Guven pêk werin." Şêrîn diyar kir ku hemû dewlet dixwazin fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û îradeya gelan tune bikin û wiha got: "Em dibêjin kes nikare îradeya me û projeya me ku ji fikr û felsefeya rêberê me Ocalan têk bibe."
Ji Fermandarên QSD`ê Şiyar Hesekê j' çalakiya grevê silav kir û wiha got: "Armanca gefên Tirkiyê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ew e ku projeya rêveberiya xweser û biratiya gelan têk bibe, lê bi îradeya me ya gelê me yê berxwedêr, em ê parastina destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan hatine standin, bikin."
Endama Kongreya Star Inûd Qirû jî wiha got: "Em piştgiriya Leyla Guven dikin, azadiya rêberê me azadiya me ye, em teqez dikin ku wek jin em ê berxwedana xwe dewam bikin."Çalakiya kon wê 2 rojan dewam bike…*ANHA*

## Jinên Tebqayê li dijî gefên dagirkirin] meşiyan




Bi sedan jinên herêma Tebqayê bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê meşek li dar xist.
Rêveberiya Jinan a Tebqayê bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk a dagirker li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, meşek li dar xist.
Meş ji gundê El-Henîda yê rojhilatê bajarê Tebqayê dest pê kir û heta Tepqayê dewam kir. Endamên Rêveberiya Jinan û bi sedan jin tev li meşê bûn.
Di meşê de pankartên "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re", "Na ji faşîstê berberî re", "Ji Erdogan re mirin" û her wiha alên MSD û QSD'ê hatin hildan.
Di meşê de dirûşmên silavkirina berxwedana QSD`ê û berxwedana şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî dagirkeriya Tirkiyê hatin avêtin.

## Welatiyên Til Temirê tev li çalakiya mertalên zindî bûn

Şêniyên Til Temirê tev li çalakiya mertalên zindî bûn ku li bajarê Serêkaniyê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk dewam dike. Şêniyan teqez kir ku ew ê bi hevre li dijî gefên dewleta Tirk a dagirker bisekinin.
Çalakiya mertalên zindî ku li bajarê Serêkaniyê li dijî êrîşên dewleta Tirk ya dagirker hatiye despêkirin dewam dike. Bi dehan welatiyên navçeya Til Temirê tev li çalakiya mertalên zindî bûn û diyar kir ku ew ê li dijî gefên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmê bisekinin.
Endamên Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Endamên partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev li çalakiyê bûn.
Di çalakiyê de Endamê TEV-DEM`ê yê navçeya Til Temirê Salih Îsa axivî û berxwedana welatiyan li dijî gefên dewleta Tirk a dagirker silav kir. Îsa destnîşan kir ku ew ê heta dawiyê bi yekitiya xwe li dijî gefên Erdogan yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bisekinin. Îsa da zanîn ku ew li ser xaka xwe dijîn, biryara wan berxwedan e û wê hemû destkefiyên ku bi saya têkoşîn û berxwedana şehîdan hatine bidestxistin, biparêzin.
Di dawiyê de Salih Îsa bang li hemû pêkhateyan kir ku tev li çalakiyan bibin û helwest û îradeya xwe nîşanî cîhanê bidin.
Wê çalakiya şêniyên Til Temirê 3 rojan dewam bike…*ANHA*



## Welatiyên Çilaxa li dijî gefên dagirkeriyê meşiyan

Bi sedan şêniyên navçeya Çilaxa ya kantona Qamişlo bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê meşek li dar xist.
Meş û çalakiyên li dijî gef û êrîşên dagirkirinê yên dewleta Tirk yên derbarê Bakurê Sûriyê de dewam dikin.
Şêniyên navçeya Çilaxa li dijî êrîşên dewleta Tirk meşek li dar xist û dagirkeriya Tirkiyê şermezar kir.
Meş ji qada navendî ya navçeyê dest pê kir. Di meşê de alên QSD, YPG û pankartên bi nivîsa "Na ji terora Erdogan re" û "Bijî biratiya gelên Sûriyê" hatin hildan.
Meş li qada navçeyê veguherî mitîngê. Di mitîngê de yek ji rêveberên PYD`ê Sirûr Şetî axivî û destnîşan kir ku şervanên QSD, YPJ/YPG`ê li dijî hemû hêzên terorîst li Sûriyê sekinîn û li ber xwe dan, hemû planên dijmin pûç kirin û bang li hemû gelan kir ku li dijî gefên Erdogan yekitiya xwe ava bikin.
Şetî diyar kir ku ew tu carî derfet nadin tu kesî ku xaka wan dagir bike û bang li hemû pêkhateyên Kurd, Ereb û Suryan kir ku li dijî gefên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê heta dawiyê bisekinin û li ber xwe bidin…*ANHA*






## Dîsa tsûnamiyê li Endonezyayê da: 222 kes mirin

Li Endonezyayê ji ber teqîna volkanekî, tsûnamî rû da. Herî kêm 222 kes mirin, bi dehan kes jî winda ne.
Pêlên deryayê yên li rojava û başûrê girava Sûmatrayê rabûn, li sedan avahiyan qelibîn.
Tsûnamî êvara Şemiyê saet 21:30'î rû da. Pêlên mezin ên deryayê, ji ber teqîna volkanê Anak Krakatoayê rabûn.
Berdevkê Saziya Rêveberiya Felaketan a Neteweyî Sûtopo Pûrwo Nûgroho got, 168 kes mirine, 745 kes birîndar bûne û 30 kes winda bûne. Lê hat ragihandin hêjmara miriyan derketiye 222 kesan.
Krakatoa, sedsala 19'an dema ku teqiya, xwelî û kevirên jê pengizîn bi qasî 20 kîlometreyan bilind bûn û mîna ewrekî li herêmê belav bûn. Ji ber teqîna volkan, herêm mîna şevê reş bûbû û tsûnamî pêk hatibû. Di encama wê teqînû tsûnamiyê de 17 hezar kes miribûn.
28'ê Îlonê bi dijwariya 7.5 pileyî erd hejiya bû û tsûnamiyê rû dabû. Di encamê de bajarê Palû hilweşiya bû û herî kêm 2.073 kes miribûn. 5 hezar kes jî winda bûbûn. Gelek kes di binê xirbeyê avahiyên hilweşiyayÎ de mabûn.

## Li El Sûsê herî kêm 90 çeteyên DAÎŞ'ê hatin kuştin

Şervanên QSD'ê, li Şefaa, El Sûsê û eniya rojhilat a Hecînê di şer de herî kêm 90 çeteyên DAÎŞ'ê kuştin.
Li Şefaa, El Sûsê û li eniya rojhilat a Hecînê çeteyên DAÎŞ'ê êrîş birin ser çeperên şervanên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) û ji ber êrîşê şerekî dijwar qewimî.
Çavkaniyên QSD'ê ragihandin, di şer de gelek baregeh û 3 wesayitên sotemeniyê yên çeteyên DAÎŞ'ê hatine rûxandin. Di şer de herî kêm 90 çete hatin kuştin û cenazeyê 12 ji wan li naverastê man.
Şervanên QSD'ê dest danîn ser gelek çek û cebilxaneyan.
Tê gotin ku şerê li herêmê bi dijwarî dewam dike.

### ZÊDEYÎ HEZAR SIVÎL HATIN RIZGAR KIRIN

Ji aliyê din ve Şervanên QSD`ê zêdeyî hezar sivîlê ji eniya El-Şafaa, El-Sûse û Baxoz yên ku çeteyan weke mertalên zindî bikardianîn piştî ku şervanan korîdorên ewle ji wan re vekirin, rizgar kirin. Şervanên QSD`ê korîdorên ewle ji 3 aliyan ve vekirin. Şêniyên herêmî jî bi rêya wan korîdoran ber bi herêmên ku ji aliyê şervanên QSD`ê ve hatine rizgarkirin ve diçin.Çavkaniyekî leşkerî ragihand ku zêdeyî hezar sivîlî berê xwe didin herêmên ku ji aliyê şervanên QSD`ê ve hatin rizgarkirin…*ANHA*





# Dengbêjan dîroka Kurdan zindî hiştiye

***Dengbêj Yemlîxan Pîrkî diyar kir ku dengbêjî dîroka Kurdan a nehatiye nivîsandin e û diyar kir ku Pîrkî anî ziman ku dengbêjên herêma Serhedê bandoreke mezin li ser wî kiriye û di heman demê de ev bandor bûye sedama degbêjbûna wî jî.***



Dengbêj Yemlîxan Pîrkî diyar kir ku dengbêjî dîroka Kurdan a nehatiye nivîsandin e û got: "Kurdan bi dengbêjiyê çanda xwe geş kirine. Dengbêjî hem dîroka Kurdî ya hatî nivîsîn û hem jî çanda Kurd a devkî ye. Dengbêjiyê dîroka Kurdan zindî hiştiye."
Gelê Kurd çand û dîroka xwe piranî bi stran, ango awazên dengbêjiyê rave kirine. Di serdema me ya îro de jî ev çand hê jî zindibûna xwe diparêze. Dengbêj Yemlîxan Yuksel (65) ku bi navê tê naskirin Yemlîxan Pîrkî, dibêje dengbêjî dîroka Kurdan a ne hatiye nivîsandine û da zanîn, çanda dengbêjiyê pira di navbera nivşan de ye. Pîrkî, di 12 saliya xwe de dest bi dengbêjiyê dike. Di sala 1954'an de li gundê Pîrkî (Serince) ya navçeya Lice ya Amedê hatiye dinê.

### 'DENGBÊJÎ JI ŞEVBIRKAN HÎN BÛ'

Pîrkî anî ziman ku dengbêjên herêma Serhedê bandoreke mezin li ser wî kiriye û di heman demê de ev bandor bûye sedama degbêjbûna wî jî. Pîrkî da zanîn ku di nava dengbêjan de, herî zêde ji Dengbêj Abdurrahim û Mehmet Alî bandor bûye û wiha axivî: "Nîştecihên gund her şev li dîwana dengbêjan dihatin li ba hevdû û ji wê demê şûn de heskirina dengbêjiyê bi min re pêş ket. Êvaran me guhdarî dengbêjan dikir û rojê jî ez şivan bûm û li ber sewalan min klam digotin. Ez dikarim bejim ez dengbêjiyê ji şevbirkan hîn bûme. Dema ku mirov fikir û ramana xwe tev bide ser karekî mirov di wî pêşeyî de pêş dikeve."

### 'DENGBÊJÎ DÎROKA KURDAN E'

Pîrkî da zanîn ku dengbêjî dîroka gelê Kurd a ne hatiye nivîsandin e û wiha dewam kir: "Dîroka her welatî bi awayekî nivîskî hatiye nivîsandin û heta roja îro hatine. Gelê Kurd jî çanda xwe bi dengbêjiyê, bi awayekî zelal raxistiye ber çavan. Dengbêjên Kurd hem dîroka Kurdan a nehatî nivîsîn, hem jî wêjeya Kurdan a devkî ji civaka Kurd re vegotine û dîroka Kurdî zindî hiştiye. Mirov dikare bêje dengbêjî hîmê çanda Kurdan e.Welatek bê çand, bê dîroke jî. Bingeha zimanê Kurdî dengbêjiye û ji bo vê yekê ji tu carê zimanê Kurdî winda nebe."

### 'DIVÊ ÇANDA DENGBÊJIYÊ DEWAM BIKE'

Pîrkî di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku divê çanda dengbêjiyê berdewam bike û wiha got: "Berê dawetên Kurdan teqez bê dengbêj derbas nedibû. Bi giştî li ser evîn, mirin û qeheremaniyê kilam dihatin gotin. Em dixwazin çanda dengbêjiyê berdewam bike. Ev kevneşopî ya kal û pîrê me ye û divê ev berdewam bike. Dema ev kevneşopî dewam dike, mirov jî hem xwedî li çanda xwe û hem jî xwedî li zimanê xwe derdikeve."

## Wexta gelê kurd azad bibe wê sînema jî azad bibe



Derhêner Kazim Oz, diyar kir ku her çend kêmasiyên sînemaya kurdî hebin jî, dîsa bi pêş dikeve. Oz, got wê azadiya gel sînemaya kurd jî azad bike.
Derhêner Kazim Oz, diyar kir ku di sînemaya kurdî de fîlmên mîtolojîk û komediyê pir tune ne. Oz, destnîşan kir ku rewşa jiyana gel rewşeke zor e û ev rewş di wê astê de ye ku bala cîhanê bikişîne. Oz got: "Niha hemû jiyana gelê kurd polîtîk e. Hema bêje tu karktereke kurd tune ye ku eleqeya wî bi siyasetê tune be. Kesên eleqeya wan bi siyasetê tune be jî bi tena serê xwe karktereke polîtîk e. Li cîhanê gelê herî polîtîk gelê kurd e. Tu biçî kîjan gundê Kurdistanê kêşanê bikî an jî hevpeyvînê bikî, kesên diaxivin bi qasî siyasetmedarekî polîtîk tev digerin. Hîn hin meseleyên gelê kurd ên nehatine çareserkirin hene."

### SÎNEMAYA KURDÎ XWEDÎ HELWESTEKÊ YE

Oz, anî ziman ku ji ber vê rewşê di sînemaya kurdî de hin çeşn kêm in. Oz, di sînemaya kurdî de bal kişand ser kêmaniya cureyên fîlmên mîtolojîk û komediyî. Oz, destnîşan kir ku sedema vê yekê jî ji ber çavkaniyên aborî ye. Her wiha Oz anî ziman ku sansur jî bandorê li sînemayê dike. Oz, diyar kir ku tevî vê dîsa jî sînemaya kurdî pêş ve diçe û got: "Her wiha pirsgirêkên wê jî hene. Mesela di dema kişandina fîlmê xwe yê Zer de bi zor û zehmetiyan re rû bi rû mam. Sansur hene û em nikarin daxilî hemû fealiyetan bibin. Em nikarin xwe bigihînin gel. Em bi zor û zehmetiyên mezin karê xwe dikin. Zimanekî wê yê baş heye, xwedî helwesteke mezin e. Lê belê ligel alwaziya xwe hindik jî tê hilberandin." "

### EM DI ŞERTÊN GIRAN DE DIXEBITIN

Oz, destnîşan kir ku ger gelê kurd azad bibe wê ev yek bi xwe re sînemayê jî azad bike û got: "Li Kurdistanê di gelek serdeman de sînema xwedî abndor bû. Lê niha kişandina fîlman, belavkirina fîlman û produksiyonên fîlman di şertên giran de dixebitin. Astengiyên pirr mezin hene."

### FÎLMÊN MIJARA WAN MÎTOLOJÎ TUNE EN

Oz, diyar kir ku sînema li ser xetekê diçe û got: "Di sînemaya kurdî de di warê hin mijar û terhan de kêmasî hene. Tenê li ser xetekê diçe. Yanî di sînemaya kurdî de zimanekî realîst heye. Di warê mijarên komedî û trajediyê de kêmasî hene. Di dîroka kurdî de mîtolojî xwedî cihekî girîng e. Lê belê fîlmên mijara wan mîtolojî ne tune ne. Çima tune ne? Ji ber rewşa aborî."
Oz, bilêv kir ku ger produksiyona sînemaya kurdî pêş ve biçe wê fîlmên bi vî etrhî jî bên kişandin û got: "Niha herî zêde kî fîlmên mîtolojîk dikişîne? Hollywood dikişîne. Çima? Lewra derfetên wan ên aborî û teknîkî pirr in. Hezar sal berê çi jiyabin wê dikişînin. Lê belê em nikarin deh salan bi paş ve biçin. Lê fîlmên komdeiyê ne wisa ne. Em dikarin bi awayekî komediyê bi pêş ve bixin. Eger em nikaribin pêş ve bixin, ev kêmasiya me ye. Ev girêdayî nêzîkatiya me ya ji bo sînema û hunerê ye. Em dikarin zimanê xwe pêş ve bixin, derûniya xwe baş bikin û xwe bigihînin hemû temaşevanên cîhanê." …*MA*

## Bi wêneyan bêrîkirina Efrînê nîşan dide

Ahrîman Hesen mamosteyê wênesaziyê ye. Pîşeya xwe bi xêzkirina çend wêneyên hêsan dest pê dike û piştre wêneyên dîwarî yên ku rengên wan bêrîkirina welatê dagirkirî Efrînê dinimînin, xêz dike
Encamên şer û dagirkirinê gelekî xirab in. Şênî gelek caran bê hêvî dimînin û bi bedbînî jiyana xwe didomînin. Lê şêniyên Efrînê bi vîn û xweşbîniya xwe ew rewş berovajî kiriye û hêviyên xwe jî qut nekirine.
Ahrîman Hesen di temenê xwe yê biçûk de ji wênesaziyê hez dike û biryar dide ku xwe bi pêş bixe. Piştî qedandina hemû astên xwendinê, derbasî peymengaha hunera wênesaziyê dibe.
Hesen beriya dagirkirina Efrînê, di dibistanên Efrînê de mamosteyê wênesaziyê bû.
Piştî dagirkirina Efrînê di 18'yê adarê de, Hesen mîna bi hezaran şêniyên Efrînê neçar dimîne ji warê xwe derkeve û li Şehbayê bi cih dibe.
Ruxmî şert û mercên koçberiyê yên dijwar jî Ahrîman di fêrkirina xwendekaran de babeta wênesaziyê li Şehbayê bi israr e. Ahrîman ji bo ku karibe hestên bêrîkirina welatê xwe yê dagirkirî Efrîn rave bike, li ser dîwarên dibistanên Şehbayê gelek wêneyên ku hestên wî rave dikin, xêz dike. Van wêneyên dîwarî bala xwendekaran jî kişand. Derfetên kêm li ber daxwaza Hesen nebûn asteng. Hesen tevî 6 xwendekaran komekê ava dike û bi pênûsa rengê reş dest bi xêzkirinê dike. Di dirêjahiya du mehan de dixebitin û 3 nexşeyên dîwarî xêz dikin.
Mijara nexşeya yekemîn sembolîk e û tê de periyek ku pifî ba dike, da ku peyva 'Efrîn' xêz bibe hatiye xêzkirin. Ya duyemîn jî girêdayî notayek muzîkê ye ku ji dûvê hespekî dest pê dike û ew notaya sirûda Ey Reqîb e. Di nexşeya dîwarî ya sêyemîn de Zerdeşt hatiye xêzkirin.




Der barê mijarê de Ahrîman Hesen wiha got: "Ji biçûkahiya xwe ve ez ji wênesaziyê hez dikim û min ji xwe re kir arezû. Piştî ku ez ji peymangehê derçûm, tê de bûm pispor û min dest bi fêrkirina hunerê ji xwendekaran re kir. Beriya dagirkirina Efrînê ez tev li gelek çalakiyên hunerî bûm. Di dagirkirinê de dibistan wêran bûn û wê jî bandoreke neyînî li derûniya xwendekaran kir. Tevî derfetên kêm me dest bi xêzkirina wan berheman kir û hestên xwe rave kirin."
Ji aliyê xwe ve xwendekara bi navê Ceylan Elî jî wiha axivî: "Ji bo xweşikkirina xuyenga dibistanan, me dest bi xêzkirina wêneyan kir. Piştî 2 mehan me 3 wêneyên dîwarî yên sembola dîroka kurdan bi dawî kirin."…*ANHA*



## Hêza Laşkerî ya YDA li Suriyê

Derwêş M. FERHO

Serokê YDA (Amerîka) ragihand ku hêza xwe ya leşkerî ji Suriyê vedikşîne. Ev ragihandin bi rêya Tweetekê da zanîn. Ewê hêza xwe bikşînin, yan na di rojên pêş me de zelal dibe. Lê weha xuya ye, eger ew bi vî awayî Amerîkî rê ji êrîşên dewleta Turkiyê re ber bi Rojavayê Kurdistan heşkere vedikin. Lê, ewê Rusya, rejîm û Îran çi bikin?

Hebûna hêza leşkerî ya YDA li Rojavayê Kurdistan girîng bû. Rê li ber êrîşen hewayî, bejayî ji aliyê dewletên Turkiyê û Suriyê dihat girtin, statuya Rojavayê Kurdistan fermî nebe jî di qada siyasî de dihat pejirandin. Lê xuya ye ku paş têkbirina DAIŞê ji aliyê hêza Kurdî YDA jî mîna gelek dewletên din niyet in pişta xwe bidin Kurdan û wan dîsa bikin qurbana siyaseta xwe ya navdewletî. Dîsa Kurd dikevin nava xefka xiyaneta çendîn caran e û li meydanê ji bo gurên har tenha dimînin.

Peywendiyên YDA û dewleta Turk giringtirîn sedeme e ku ev biryar tê stendin. Ji ber ku hevkariya YDA û hêza parastina Bakur-Rojavayê Suriye, ku YPG-YPJ tê de ciyê xwe digrin, mîna şûjinekê dikeve çavên rayedarên Turk û ji destpêkê ve nerazîbûna xwe didin zanîn. Dewleta Turk ne ji temamiya vê hêzê aciz e. Derdê wê YPG-YPJ, hêza Kurdî ye. Ne ku YPG-YPJ sûcek di hember dewleta Turk de kiriye. Kurdbûna vê hêzê ye ku nayê qebûlkirin û mixabin, YDA di serî de, hemû cîhan bêdeng e. Bi vê bêdengiya xwe jî qirêja dewleta Turk dipejirînin.

Êrîş, zilm û dagîrkirina Efrînê berî çend mehan di bîra me de ye. Dunya di hember vê yekê de bêdeng ma, xwe kerr û lal kir. Dewleta Turk pirraniya xelkê Efrînê mecbûr hişt koçber bibe. Komên xwe yên terorîst di wira de li hev dane hev. Mal û milkê xelkê talan, dizî, xera kir. Ne Rusya, ne YDA, ne jî YE bi awayekî durust dengê xwe kirin. Ji demekê vir ve rayedarên Turk gelek gefan di hember herêmên din yên Rojava jî dixwin. Çend caran êrîş jî birin ser hin ciyan. Şehîd çêbûn, xelk hat qurbankirin. Talan û dizî ji aliyê hêza leşkerî ya Turkiyê û komên çeteyên vê dewletê dubare bûn. Dîsa bêdengî hebû û hê jî heye. Herçend e çend caran rayedarên YDA nerazîbûna xwe da zanîn jî tiştek nehate guhertin.

Federasyona Demokratîka Suriyê ne di dema Efrînê de û nejî niha li hêviya vê biryarê bûn. Hê xiyaneta Rusya li Efrînê bi Kurdan re kir taze ye. Niha jî ev biryar kete rojevê. Niha jî ev xiyanet dubare dibe.

Xuya ye beşek ji rayedarên YDA dixwazin peywendiyên xwe, NATO û Turkiye taze bikin. Wî beşê YDA serê xwe li ber gef û nerazîbûnên dewleta Turk tewandin. Kirrîna çekên nuh (Patriot ground-air missiles ji Raytheon) ji YDA bi buhayê 3,5 milyard dollar ji aliyê Turkiyê rê li ber çekên Rusya jî girt. Pirsgirêka Kirim li nabera Ukrayna û Rusya, Iran, rewşa Turkiyê di vê pazarê de ne. Çiqas ji siyasetmedarên YDA bi vê biryarê razî û kêfxweş in pirseke din e. Ji ber hin dengên din tên bihîstin ku bi vê biryarê ne hemfikirin. Çend senotorên ji partiya Republik û çendeke demokratan nerazîbûna xwe dan bihîstin. Wezîrê parastinê ^sitîfa xwe da. Wan da zanîn ku daxwaza Pentagon ne ev e. Wan da xuyakirin ku plana mayinê hebû û di wê çarçewê de kar dibû were kirin. Ev biryar ji aliyê Trump û ekîba wî hatiye dayin.

Rejîma dîktator ya Suriye, Îran û Rusya, bi vê biryarê çawa tevdigerin pirseke giring e. Gelo Rusya û Îran ewê çi bikin eger Turk bikevin herêmên din li Suriyê? Kêfxweş dibin yan na? Gelo ewê rejîm û hêzên Bakur-Rojava li peywendiyên nuh negerin di hemberê hêzên dagirker de?

Hêzên Bakûr-Rojavayê Suriyê di berxwedana xwe de bi biryar in û ewê di her qadî de bersiva êrîşên ji ku tên bila werin bidin. Ew dizanin ku ewê berxwedana wan bibe sedema gelek qurban û zererê. Serê xwe ji îxanet û bêbextiyê re natewînin. Serketin ya wan e.

# Erka HPC'ê ya sereke parastina welatiyan e

**Li Bakurê Sûriyê di parastina civakê de Hêzên Parastina Civakî xwedî roleke girîng in. Di van çend salên dawiyê de HPC'ê di warê parastinê de karên mezin kir. Endamên Hêzên Parastina Civakî yên Dirbêsiyê diyar kirin ku erka wan ya sereke parastina gel û civakê ye.**



Hêzên Parastina Civakî ya navçeya Dirbêsiyê ji destpêka hatiye avakirin ve li gel hêzên Asayîşê herêmê diparêze. Endamên Hêzên Parastina Civakî gotin, "Erka me ya sereke parastina şêniyan e."
Hêzên Paristana Civakî (HPC) ya navçeya Dirbêsiyê ya girêdayî kantona Hesekê ji destpêka avakirina xwe ve di sala 2014'an de, erka ewlehiya şêniyan dide ser milê xwe û navendeke parastina civakî vekir û perwerdeya leşkerî û siyasî dît.
Di salekê de 10 dewre ji welatiyên herêmê re bi dawî kirin, heta niha şêniyan perwerde dikin ku xwe bi xwe parastinê bikin.
Yek ji erkên vê hêzê, piştgiriya YPG`ê û hêzên Asayîşê ye û parastina kolanên di hundirê bajêr û bajarokan û avakirina bendên kontrolê bi hêzên Asayîşê re ye. Her wiha HPC beşdarî pêngavên ku YPG, YPJ û QSD'ê ji bo rizgarkirina Bakurê Sûriyê ji çeteyên DAIŞ`ê dabûn destpêkirin, bû.
Endama Rêveberiya HPC-Jin Nesrîn Dirbêsiyê axivî û wiha got: "Erka me parastina şêniyan û herêmê ji hemû êrîşan e. Em şêniyan perwerde dikin da ku parastina xwe bikin."
Endama bi navê Nûra Xelef jî axivî û got: "Erka me ya sereke parastina şêniyan e."…*ANHA*

## Firina Zagroz bi keda jinan tê rêvebirin



Ji destpêka şoreşa Rojava de jin di hemû qadan de çi civakî, siyasî, leşkerî û taybeyt aborî de xwedî rolek pêşngtî lîstin. Her wiha di milê pêşxistin aboriya jinê de gelek projeyên aborî taybet bi jinê hatin avakirin ku yek ji van projeyan firina bi navê Zagros ya li Girkê Legê hatiye vekirin nan bi dest û keda jinê tê çêkirin.
Girêdayî mijarê karmendên jin yên ku di firinê de dixebitin diyer kirin ku ji dîroka civaka xwezayî de her jin xwedî afrîneriyê û her jin nanê tenûrê lêdi xist yanî ev ne tiştî nû ye ku jin firinê bi rêvebibe."

### JI BO XWE IFADEKIRIN DIÇIM KAR

Karmenda bi navê Meyada Osman diyar kir ku ew kesek ji ber rewşa madî û rewşa şer xwendina xwe temam nekir, lê ev li pêşiya pêşxistina wê ne bû asteng û wiha domkir: "Kar û xebat tiştekî herî girîn di jiyana mirovan deye, raste min xwendina xwe temam nekir. Lê di her dema ku ezdi çim firinê hem hebûm xwe îsabat dikin û him jî alîkariyê bi malbatê re dikim. Ev karê firinê û çêkirina nan ji dîroka mirovahiyê de ayîdî jinê ye, lê hişmendiya kevneşopî ev rol ji destê me hatibû birîn. Lê bi saya şoreşê dîsa me ev rol vegerand."
Meyada Osman di dawî de got: "Tevî dem dirêjiya xebat jî, lê kêfxweşim ji ber ku ji kar hez dikin. Her wiha di firinê de du werdiye ne, danê sibê û êvarî û her werdiyek 12 seatan dixebite."

### BI XEBAT FÊRÎ ÇAWANIYA XWE RÊVEBIRINÊ BÛM

Jina bi navê Menar Metre jî anî ziman ku ji ber ku ew pênaber û pêwîstiya wê bi kar heye di vê firinê de dixebite û wiha got: "Ev 4 mehin ku ez di firinê de dixebitim û gelek rehetim di vî xebatî de, ji ber ku em hemû jin bêyî cûdahiya netewî bi yek destî xebat dikin, bi hevre jiyana komînal di firnê de dimrşînin. Û wiha bi dawî kir: "Bi vî xebatî ez bi malbatêre alîkarim, her wiha bû derfet ku çawaniya rêvebirina mal û berpirsiyartiyê hilgirim. Bi vî rengî him di milê aborî de alîkariya malbatî kir û him jî kesayeta xwe pêşxist."
***Rapor: Lêgerîn Xanî/ Werger: Semîra Mistefa***

## Du çayxaneyên Rewandizê nêzî sed sale çayê pêşkêş dikin



Çayxaneyên Seyid Cebar û Rawandiz du çayxaneyên kevin ên navçeya Rewandiz a ser bi parêzgeha Hewlêrê ne yek nêzî 100 sale û yek jî 50 sale çayê pêşkêşî mêvanên xwe dikin.
Çayxaneyên Rewandizê êvaran zêdetir welatî diçinê. Li gel kesên bi temen ên li çayxaneyê aramiyek heye. Ji ber aramiyê rojane hunermend, rewşenbîr û kesayetên civakê serdana wan çayxaneyan dikin.
Çayxaneya Seyid Cebar çayxaneya navçeyê ya herî kevne ku di sala 1920'an de hatiye çêkirin. Niha çayxane dikeva deriyê bazara Rewandizê û destpêkê li navenda bazarê bû. Piştî ku Seyid Cebar koça dawî kir, çayxane weke çayxaneya kon (kevin) tê bi nav kirin. Yek ji kurên wî yê bi navê Seyid Teha bi heman dîzayna berê çayxane çêkiriye.
Mam Hemze yek ji wan kesane ku çayxaneyên Rewandizê weke cihê bêhn vekirinê û derbaskirina dem dibîne û heftane herî zêde serdana çayxaneyê dike. Mam Hemze got, "Her kesekî ku li Rewandizê winda bû, dikarî li çayxaneyê bibînî. Çayxaneyê wiha kiriye ku her Rewandiza kevin li ser çavê me be."
Li çayxaneyê nirxê yek şûşe çay bi 250 dînar e. Çayxaneya Seyid Cebar ji aliyê Semî Rewandizî ve tê rêvebirin. Samî wiha qala çayxaneyê dike; "Me demekê konkan û domîno danî. Piştre derkete holê ku weke berê xelk nayê çayxaneyê. Niha me ew lîstokan rakirin. Niha xelk zêdetir tên."
Çayxaneya Rewandiz jî yek ji çayxaneyên kevin ên Rewandizê ye û di sala 1970'an de hatiye vekirin. Ji aliyê Mam Ebdullah Rewandizî û kurên wî ve tê rêveberin. Di sala 2008'an de hate nûkirin. Li navçeyê çayxaneya wan bi navê çayxaneya Rewandizê tê naskirin.
Mam Ebdullah Rewandizî temeke li ber çayxaneyê û niha jî naxwaze dest jê berde. Bi taybet ji zarokên xwe re gotiye ku dema mir jî, divê çayxane berdewam bike. Mam Ebdullah wiha qala çayxaneyê dike, "Çayxaneya Rawandizê di demsalên havîn û zivistanê de jî bazara wê baş e. Lê, di demsala zivistanê xwesteka çayê zêdetir e."
Mam Ebdullah eşkere kir ku tenê îsal sobeya daran bi kar neanîne. Dîwarên çayxaneyê ji wêneyên kevin ên li nava çayxaneyê hatine kişandi, hatine xemilandin. Ew kesên ku serdana çayxaneya Rewandiz dikin, eşkere dikin ku ji ber aramî û bêdengbûnê wiha kiriye ku heman xweşiya berê lê hebe…*ROJNEWS*

**RAMANÊ RÊBERTIYÊ**



## Bi kurtî pêkhatina dîrokî ya rastiya kurd

**Abdulah Ocalan**

Ez di beşên (cild) berê yên parêznameyên xwe de li nava dîrokê bi pey rastiya Kurd ketibûm. Lewma ji dubarekirinê zêdetir, li qonaxên girîng der barê diyardebûna wê de mirov hinek analîzan bike, bawer dikim wê bêhtir kêrhatî be, û mirov ê pê pêşiya xwe bibîne. Kurdîtî di dîrokê de rastiyeke timî di cihê xwe de sabit û bistbûyî sekinî nîne. Weke her diyardeyeke civakî bi veguherînê hebûna xwe pêşde dibe. Veguherîna di rewşa aniha de berfirehtir û bileztir e. Diyardeya Kurd a roja me ya îro di pêvajoyeke werê re derbas dibe pêdiviya xwe bi ravekirineke berfireh heye. Di rêûresma berê de bi awayekî hunerî xweîfadekirin yek ji şêwazan e ku herî zêde mirovan pêk aniye. Ji vî alî ve Kurdîtiyê bi rêya muzîkê hewl daye xwe bide naskirin. Bi vî awayî, ji bo heqîqeta Kurd muzîk dibe şêwazê herî girîng ê îfadeyê. Di şêwazê zanistî yê piştrastkirî de pêşketinên girîng hene. Hewldan hene ku bi têgînên dîrokî û civakî Kurdîtî bi rêbazên cuda bê ravekirin û piştrastkirin. Xebata akademîsyenan bêhtir di vî warî de ye. Nêzîkatiyên li ser bingehên îdeolojîk bêhtir bi îdealên rizgarîxwaziyê barkirî ne, lê tevî vê, ji bo îfadekirina heqîqetê jî pirr kêrhatî ne.
Bêguman karekterê çînî yê her îdeolojiyê li gorî xwe bi heqîqetekê radibe. Herçiqasî her model bi tena serê xwe hewl bide heqîqetê rave bike jî bi tenê dikare beşekî ji temsîla rastiyê îfade bike. Diyardeya civakî bi xwe zorê dide vê yekê. Mîna tabloyeke sêrengî ye, çawa ku di nava wan de rengekî beloq têrê neke wan îfade bike. Di ravekirina civaka dîrokî de nêzîkatiyên tek modelî di warê temsîla rastiyê de timî kêm in, û mirov ê bi wan bixape. Kengî mirov asta şêwe û maneya tevlîhev a civakan li vê zêde bike, hingê bikaranîna yekpare ya tevahiya rêbazên temsîla parçeyên rastiyê dikin girîng dibe.
Di serdema me de rêbazên zanistî giraniya xwe çêdibin, lewma pêşhukmên dibêjin, rêbazên din nikarin heqîqetê îfade bikin, bi hêz dibin. Lê kaosa zanistî ya pêk tê, eşkere kiriye ku rêbazên xwe sipartiyê bi temamî têrê nakin. Rêbaza zanistî bi xwe kelemekî ciddî ye ku nahêle mirov li heqîqetê serwext bibin û fêhm bikin. Her ku diçe têkiliya rêbaza zanistî bi îdeolojî û desthilatdariya hegemonîk a sîstema şaristaniya Rojava re eşkere dibe. Ji bo hebûn xwe pêk bîne, pêdiviya xwezaya wê ye ku nêzîkatiyên beş û gerdûnî yên der barê heqîqetê de bi hev re bi kar bîne.



# Jin minetdarê Rêber Ocalan in

**Jina ji Efrînê Şadya Hec Elîko ku du caran bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin kiriye diyar kir ku gotinên ku Rêber Ocalan wê demê ji wan re gotî îro pêk tên. Şadiya wiha got, "Em jin em ê her dem minetdarê Rêber Ocalan bin. Ji ber ew ji bo maf û azadiya jinan têdikoşe."**



Şadya Hec Elîko du caran bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin kiriye. Şadya dibêje gotinên Ocalan ên wê demê îro pêk tên.
Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dema ku li Lubnan û Sûriyê bû, bi gelek welatiyan re rûniştiye. Di nav de welatiya bi navê Şadya Hec Elîko jî heye. Şadya ji Efrînê ye û du caran bi Ocalan re rûniştiye. Şadya dibêje gelê Rojhilata Navîn bi fikir û rêgezên Ocalan ve girêdayî ne.
Şadya hevdîtina xwe ya yekemîn bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re bi bîr xist û wiha got: "Di rûniştina yekemîn de, Ocalan behsa vîn û hêza ku divê li gel me hebe heta em bigihîjin azadiyê kir û diyar kir tevgera azadiyê bi 6 kesan dest pê kir û bi baweriya bi armancên xwe tevger mezin bû û gelên Rojhilata Navîn pê bawer kir."
Şadya wiha dewam kir: "Ocalan wê demê texmîn dikir ku wê şerên ku hebûna gelê Kurd dikin hedef li herêmê rû bidin, ji ber wê pêwîstiya yekitiya kurdan û birêxistinkirina gelê Kurd anî ziman."
Şadya destnîşan kir ku Ocalan bal dikişand ser azadiya jinan û rola wê ya pêşeng di avakirina civakeke demokratîk û azad de û wiha dewam kir: "Em ê her tim minetdarên Ocalan bin, ji ber ku ew tekane têkoşer e ku bi azadiyê jinan bawer kir û ji bo azadiya jinan û hemû mafên wan têkoşiyaye."
Di dawiyê de Şadya tecrîdkirina Ocalan şermezar kir û bang li hemû hêzên navnetwî kir ku li dijî kiryarên dewleta Tirk bikevin nava tevgerê…*ANHA*

## Divê li hemberî gefên Tirkiyê rabin ser piyan



Enadmên Kongreya Star a Lubnanê gefên Tirkiyê li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê şermezar kirin. Her wiha destnîşan kirin ku hikumeta AKP'ê bi rêya destdirêjkirina li hemberî jinên têkoşer û berxwedêr dijminahiya têkoşîna gelê Kurd dike. Endamên kongreyê bang li hêzên demokratîk û mirovî kirin ku li hember gefên Tirkiyê rabin ser pêyan.
Rêxistina Kongreya Star ya li Lubnanê li peytexta Lubnanê Beyrûtê girêdayî gefên Tirkiyê yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyanî dan.
Bi dehan endamên Kongreya Star li ber Weqfeya Newroz a Çandî û Civakî tevlî daxuyaniyê bûn.
Daxuyenî ji hêla endama kongreyê Rojîn Hesen ve hate xwendin.
Daxuyanî wiha ye:
'Dewleta Tirk destekê dide çeteyên DAIŞ'ê û dijminahiya gelê Kurd dike. Niha jî dixwaze Bakurê Sûriyê dagir bike.
Di destpêka vê salê dewleta Tirk û çeteyên wê bi erêkirina Rûsya bajarê Efrîn piştî êrîşên hovane dagir kir. Niha jî berê xwe daye herêmên Bakurê Sûriyê yên ewle û dixwaze wê di nav bêdengiya dewletên koalîsyonê de û bi hindek lihevkirinên veşartî de dagire bike.
Dewleta Tirk bi rêya hedefgirtina jinên têkoşer ên Rojava, Şengal û Mexmûr dijminahiya têkoşîna gelê Kurd dike. Ev pergal destek dide DAIŞ'ê hemû binpkirinên ne exlaqî li dijî jinan. Em teqez dikin ku ev pergal wê bi destê têkoşerên jin ên ku fikr û felsefeya Ocalan ji xwe re kirine bingeh û berxwedanek bêhempa di girtîgehên dewleta Tirk a dagirker de nîşan didin mîna pelementera Kurd Leyla Guven, bi dawî bibe.
Gefên Tirkiyê nayên qebûlkirin û divê raya giştî ya navdewletî û bi taybet Hêzên Koalîsyonê bêdeng nemînin.
Heta niha jî Sûriye û Rûsya ji ber hesab û berjewendiyên xwe tu bertek nîşan nedane. Divê gelên cîhanê bertekek cidî li hember gefên Trikiyê li dijî gelên herêmê nîşan bidin.
Îro DAIŞ têk çû, em bi hêvî bûn ku aliyên rê li ber derketina DAIŞ'ê vekirin û sûcên şer pêk anîne werin cezakirin. Lê xuyaye ku hemû desteka dewleta Tirk a ku rê li ber derketina DAIŞ'ê vekiriye dikin. Tirkiye heta niha gefa êrîşan li Kobanê, Girê Spî, Minbic, Reqa, Dêrazor, Şengalê û Mexmûrê dixwe û êrîşî gelan dike.
Gefên Tirkiyê tê wateya desteka DAIŞ'ê. Li ser vê esasê em bang li tevahiya gelên herêmê, hemû hêzên demokratîk û mirovahiyê dikin ku li hember van gefan rabin ser pêyan, da ku rê li ber pêkanîna kiryarên din bêne girtin.
Her wiha em bang li NY'yê dikin ku bi berpirsyariyên xwe li hember gefên Tirkiyê rabin û asîmana Bakurê Sûriyê ji balafirên Tirkiyê re bigirin.

## Divê her kes ji bo Efrînê rabin ser piyan





Jinen Êzidî yên Xanesorê û Sinunê ji bo pişgiriya gele Efrinê axivîn û diyarkirin ku ew ê heta dawî piştgiriya gelê Efrînê bikin.
Jinen Êzidî yên Xanesorê û Sinunê ji bo pişgiriya gele Efrinê axivîn û diyarkirin ku çiqas dewleta Tirk erişî gelê Efrînê bike ew ê civaka Êzidî hertim li gel Efrinê be.

### JI BO EFRÎNÊ BÊ DENG NEMÎNIN

Jina bi navê Delal Revû ku axivî wiha got: "Bi rasti em wekê jinen Êzîdî van erişên li ser gelê me yê Efrinê qebûl nakin. Ev erişên dijmirovî ne. Gele Efrinê 65 rojan li berxwe da û heya roja me ya iro jî li ber xwe dide. Li gel vê berxwedanê dewleta tirk bi hemû tang û topên xwe êrîşî Efrînê dike û bi taybetî zarok û jinan qetil dike. Em dixwazin ku her kes li dijî van êrîşan rabe ser piyan. Gele Efrinê di 3'yê Tebaxa 2014'an de bi hewara Êzidiyên Şengalê de hat û ew ji komkujiyê rizgar kirin. Em jî ji her kesî dixwazin ku ji bo Efrînê rabin ser piyan. Em bang li dewletên navnetewî jî dikin ku ji dijî van êrîşên dewleta tirk bêdeng nemînin"

### DIVÊ GELÊ EFRÎNÊ VEGERE SER AXA XWE

Jina bi navê Şirin Îdo jî di derbarê êrîşên li ser Efrinê de ev tişt got: "Em dewleta tirk û hevkarin we şermezar dikin. Roj bi roj êriş dikin. Em dixwazin gelê me yê Efrinê bi serbilindî vegere ser axa xwe. Li dijî dijminê ku dixwaze Gelê Kurd tune bike em ê heta dawî li ber xwe bidin û em tune nabin. Bila hemû gelê me ji bo gelê Efrînê vegere ser axa xwe li ber xwe bide û piştgiriyê bide gelê Efrînê."…
***JINNEWS***

## Jinên Ereb wê li dijî gefên Erdogan li ber xwe bidin

Jinên Kantona Şehbayê yên Ereb diyar kirin ku bi hemû hêza xwe amade ne ku li hember gefên Erdogan ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê bisekinin.
Derbarê gefên dagirkirinê yên serokê rêjîma faşîsta a Tirk Erdogan ên li ser Rojhilat û Bakurê Sûriyê jinên Ereb diyar kirin ku li dijî hemû gefan ew ê têbikoşin û gotin: "Dewleta Tirk a dagirker her dem ji bo berjewendiyên xwe êrîş dike û mirov û xwezayê qetil dikin. Em ê destûrê nedin qirkirin û qetlîamên nû."

### EM Ê TÊKOŞÎNA XWE BIDOMÎNIN


Jina bi navê Sebah Xudir wiha got: "Erdogan bi gefên xwe hêza jinê û yekîtiya gelan hedef digire. Lê em ê li dijî sîstema diktator her tîmî têbikoşin. Erdogan dema ku Efrîn dagir kir gelek komkujî pêk anî niha dixwaza komkujiyên nû pêk bîne. Divê em bibin yek û cîhan jî li dijî gefên Erdogan ên rê li komkujiyê nû vedikin bêdeng nemîne. Em dev ji têkoşîn û baweriya xwe bernadin. Em ê heta dawî têkoşîna xwe bidomînin."


### EM JI ÊRÎŞAN RE AMADE NE

Zehra Kelo diyar kir ku ew li dijî hemû êrîşan ama de ne û wiha got: "Em di nava hewldan û tevgerekê de ne. Loma em li dijî gefan serî natewînin. Gefên Erdogan wê tu carî tirsekê di dilê me de ava neke. Berojavî vê yekê em bi hêztir dibin. Em ê li dijî êrîşan heta dawiyê bisekini. Bila Erdogan bitirse."









### SERKEFTIN YA ME YE

Jina bi navê Xezal Elo ya ji Navçeya Ahrezê wiha got: "Em van gefên dewleta tirk qet qebûl nakin. Erdogan wê tu carî nikaribe xewn û xeyalên xwe pêk bîne. Wê hemû hewldanên wî vala derbikeve. Em ê bi hemû cureyên têkoşînê li dijî gefan derkevin. Berxwedan û serkeftin a me ye."

### HÊZ BI BERXWEDANÊ ZÊDE DIBE

Emil Ismaîl ya ji gundê Um Hoş axivî û wiha got: "Em gefên Erdogan ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê tu carî qebul nakin. Em bi hemû hêza xwe amade ne ku li dijî gefên Erdogan bisekinin. Hêza mirovan bi berxwedanê zêde dibe. Em ê jî her li berxwe bidin. Em ê yek dilî li dijî sîstema diktator a li Tirkiyê bisekinin. Dewleta tirk a dagirker her dem ji bo berjewendiyên xwe êrîş dikin û mirov û xwezayê qetil dikin. Em ê destûrê nedin qirkirin û qetlîamên nû."…*JINNEWS*

# Emê li dijî êrîşên Tirkiyê li ber xwe bidin

**Hevserokê Meclisa Sivîl a Reqayê Mişleb El-Derwîş diyar kir ku dewleta Tirk bi gef û êrîşan dixwaze aramî û yekîtiya li Bakurê Sûriyê têk bibe û wiha got, “Em hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê em ê li kêleka QSD’ê bisekinin û axa xwe ji êrîşan biparêzin.”**




Hevserokê Meclisa Sivîl a Reqayê Mişleb El-Derwîş destnîşan kir ku Tirkiye bi serkêşiya Erdogan dixwaze yekitiya Sûriyê têk bibe û diyar kir ku ew li rex QSD’ê li ber xwe didin û wê herêmê biparêzin.
Hevserokê Meclisa Sivîl a Reqayê Mişleb El-Derwîş destnîşan kir ku Tirkiye vîn û destkeftiyên gelê herêmê armanc dike.
Mişleb gef û êrîşên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê şermezar kir û wiha got: “Bakurê Sûriyê wê wekî striyekê di qirika Erdogan de bimîne û em li Bakurê Sûriyê di nav yekîtî û biratiya gelan de dijîn û em bi hevre li rex QSD’ê axa xwe diparêzin.”
Mişleb destnîşan kir ku Tirkiye bi armanca dirêjkirina temenê DAIŞ’ê yê ku nefesa xwe ya dawîn li Hecînê distîne, gefan li herêmê dixwe. Meşleb diyar kir ku divê hikumeta Sûriyê û hemû aliyên ku destê wan di aloziyê de heye, bertekeke cidî li hember gefên Tirkiyê nîşan bidin.
El-Derwîş bal kişand ser rola neyînî ya Koalîsyona Niştîmanî û wiha got: “Yê ku xwe bifiroşe, welatê wan nîn e. Em li welatê xwe dijîn û ew jî ji bo me buha ye. Em ê li hember artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê keleheke berxwedanê ava bikin.”
El-Derwîş armanca gefên Tirkiyê destnîşan kir û wiha axivî: “Tirkiye bi gefên xwe têkbirina tevna civakî û çandî ya gelê Sûriyê û jiyana hevpar di navbera pêkhateyên wê de armanc dike. Tirkiye dixwaze aloziya xwe derbasî dewletên cîran bike.”
Hevserokê Meclisa Sivîl a Reqayê Mişleb El-Derwîş di dawiyê de wiha got: “Tirkiye dixwaze yekitiya Sûriyê têk bibe û bi taybet piştî ku gelek herêm dagir kirin, bi taybet Efrîn. Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê gelek binpêkirinênhovane yên mîna kuştin, talankirin û destavêtinê pêk anîn. Ji lewre ji me tê xwestin ku em li hember her êrîşekê ewlehiya herêmê tehdîd dike, bi hevre bisekinin.”…*ANHA*

## Asûr/Sûryan divê li dijî qirkeran rawestin



Partiya Azadiyan a Mezopotmayayê (MOP) li dijî gefên dagirkeriya Tirk helwest nîşan da û banga li gelên Asûr/Sûryan/Keldan kir ku li dijî hişmendiya qirker a dewleta Tirk helwesta xwe diyar bikin.
MOP’ê têkilî biryara vekişînê ya Amerîkayê, gefên dewleta Tirk ên dagirkeriyê û li ser tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyaniyek da.
Têkilî biryara vekişînê MOP’ê got, ‘’Ji dewleta Tirk re vekirina rê ye ku pergala Federasyona Bakurê Sûriyê dagir bike’’. MOP’ê bal kişande ser komkujiyên dewleta Tirk ku ji ji Şerê Cîhanê yê 1’ê ve dike.
MOP’ê di daxuyaniyê de diyar kir, dewleta Tirk dixwaze destkeftiyên gelên Rojava bifetisîne û got, ‘’Di demeke wiha de ku dijminê mirovahiyê DAÎŞ têk diçe, biryara vekişînê ya DYA’yê tê wê maneyê ku dewleta Tirk dîsa destekê bide çeteyên DAÎŞ’ê. Her wiha ev êrîşeke dagirkeriyê ya bi kontrola kapîtalîzmê ye ya li ser pergala demokratîk, wekhevîxwaz û azadîxwaz ku tê xwestin bi vîna gelên Mezopotamyayê/Kurdistnaê were avakirin. Di vê rewşê de derdikeve holê ku kapîtalîzm bi Îslama siyasî û nokerên xwecih de hevalbend e.’’
MOP’ê bi berdewamî got, ‘’Helbet yek ji peywira me ya sereke ye ku em destekeftiyên gelê xwe biparêzin.’’
MOP’ê got, ‘’Bi vê çarçoweyê banga me li gelê Asûr/Sûryan/Keldan ew e ku li dijî hişmendiya qirker a 1915’an a dewleta Tirk rawestin û ev helwest tê maneya xwedîderketina li vîn, rûmet, nirx, dîror, çanda gel û şehîdan.’’
Têkilî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî MOP’ê greva birçîbûnê ya li Strasboûrgê slav kir û got, tecrîda li ser Ocalan tecrîda li ser gelan, kedkaran, ciwan, jinan û tecrîda li ser vîna demokratîk e.
Di daxuyaniyê de hate gotin, ‘’Banga me li raya giştî ya cîhanê ew e ku tecrîdê bibînin, destekê bidin çalakgerên greva birçîbûnê û li bara faşîzma dewleta Tirk bêdeng nemîne!
Doza heq a demokratîk a gelên Mezopotamya/Kurdistanê û Anatoluyê, civîna li dor Şoreşa Rojava wê faşîzma dewleta Tirk ku ji Îttîhat Terakkiyê û heta niha tê hilweşîne. Rawesta li dijî kapîtalîzmê, îslama siyasî û nokerên wan ên xwecih, rawesta li ser nirxên sincî yên mirovahiyê ye.’’

## Bê statu hiştina kurdan êdî zehmet e



Seroka Giştî ya EMEP’ê Selma Gurkan diyar kir ku biryara vekişîna DYA’yê ya ji Sûriyê ne nû ye û da zanîn ku ji lihevkirina di hevdîtina Helsînkî ya di navbera serokê DYA’yê Donald Trump û serok Rûsyayê Vladîmîr Putîn pêk hatiye, serbixwe nîne. Selmayê ev tişt got: “Di roja îro de bê statu hiştina kurdan zehmet bûye. Di vir de tişta esas xeta têkoşînê ya aştî, azadî û wekheviyê ye.”
Seroka Giştî ya Partiya Kedê (EMEP) ya li Tirkiyê Selma Gurkan geşedanên dawî û êrîşên Tirkiyê yên li hember Şengal û Mexmurê, amadekariya operasyona li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nirxand.
Selmayê diyar kir ku li Sûriyê ji serî de şerê parvekirinê yê emperyalîstan heye û da zanîn ku heta pevçûn û hevrikî bidomin wê guherîn çênebe û wiha got: “Bi mudaxaleya DYA, Rusya, welatên Ewropa û hêzên emperyalîst Sûriye ketiye vê rewşê. Di çûyîna Esad de israr kirine. Rêxistinên çete yên cîhadî yên wekê DAIŞ’ê biguman nedîtine. Tirkiyê ji serî de di ‘Osmaniya Nû’ de israr kirye û vê şaşiya xwe hîna didomîne. Niha welatên ereb ketine dewrê. Ji ser Sûriyeyê li erdnîgariya Rojhilata Navîn qadên serdestiya hevkar û emperyalîstan ji nû ve diyar dibin. Yanî welatên duh dijminê hev bûn îro ji bo berjewendiyên xwe ketine têkiliyê.”Selmayê di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku DYA’yê biryara vekşîna ji Sûriyê girtiye, lê sînorên vê vekişandinê hîna nayên zanîn û wiha got: “Ji bo hêzê hatibûn vir û niha wisa vekişîna wan xuya dike ku planên wan hene. Hîna ev aşkera nekirine. Dema mirov lê dinêre mirov dibîne ku hewl didin pêşeroja herêmê diyar bikin. Erdogan û hikûmet ji vêrewşê ji xwe re serkeftinê derbixin jî rewş cuda ye. Biryara vekişînê ne nû ye. Ji mutabakata di hevdîtina Helsînkî ya di navbera serokê DYA’yê Donald Trump û serok dewletê Rûsyayê Vladîmîr Putîn pêk hatiye de, serbixwe nîne.”Seroka Giştî ya Partiya Kedê Selma Gurkan di dawiya axaftina xwe de daxuyakirin ku ne emperyalîst û ne jî serdestên herêmî berjewendiyên gel nafikirin û diyar kir statuya Gelê Kurd ne derdê DYA û Rûsyayê ye û got: “Di roja îro de bêstatuhiştina Kurdan zehmet bûye. Di vir de ya esas xeta têkoşînê ya aştî, azadî û wekheviyê esas digire ye.”…*JINNEWS*

## Em ê li dijî êrîşên Tirkiyê destkeftiyên xwe biparêzin



Şêxên êlên bajarê Reqayê destnîşan kirin ku wê gelê herêmê destkeftiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê biparêzin û diyar kirin ku bi QSD‘ê re ne.
Meclisa Sivîl a Reqayê şevê din bi armanca nirxandina geşedanên siyasî û leşkerî yên dawî bi civînek li dar xist. Şêxên êlên El-Efdalê, El-Musa El-Dahêr, El-Berîc, El-Welde, Hatêm El-Tey, El-Bû Esaf, El-Bûbena, El-Helîsat û El-Bû Hemîd, kesayetên leşkerî yên QSD’ê û hevserokê Meclisa Sivîl a Reqayê Mişleb El-Derwîş tev li civînê bûn.
Di destpêka civînê de rûspiyê êla El-Mûsa El-Dahêr a bajarê Reqayê Ayid El-Hadî axivî û got: “Mixabin dewletên Ereb dema zarokek an jî rojnamevanek li Tirkiyê were kuştin hemû şermezar dikin û mudexele dikin, lê dema zarokên Sûriyê têne kuştin û koçberkirin, ew bêdeng dimînin.”
El-Ayid wiha dewam kir: “Gelo dewletên cîhanê ji kuştina zarokên Efrînê û koçberan li ku derê ne? Gelo ew dewletên ku banga mafên mirovan dikin çima daxuyanî nedan an jî gotin operasyonên Tirkiyê li Sûriyê dagirkerî ye?
El-Ayid destnîşan ku ew wek êlên Reqayê piştgiriya QSD’ê dikin û wiha dewam kir: “Em ji dagirkeriya Tirk re dibêjin na, gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne şerxwaz in, em têkîliyên baş bi cîranê re xwe re dixwazin. Lê eger Tirkiyê şer dixwaze wê demê em amade ne û wê li pêş bi hêza zarokên me matmayî bimîne.”
Fermendarê QSD’ê LOqman Xelîl jî di civînê de axivî û diyar kir ku gefên Tirkiyê hemû gelên herêmê dike hedef.
Loqman wiha dewam kir: “Dewletên dijberî projeya demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewl didin ewlehî û aramiya herêmê têk bibin. Piştî rizgarkirina herêm ji hêla QSD’ê ve herêm di hemû warên jiyanê de pêş dikeve. Ji ber wê dewletên dijber hewl didin tevlihevî û fîtneyan di navbera pêkhateyên herêmê de belav bikin. Em herêmên xwe û desketiyên xwe li hember her êrîşan biparêzin.”
Di civînê de yek ji rûspiyên bajarokê El-Hûs a rojhilatê gundewarê Reqayê Ehmed El-Elî axivî û got: “Gelo dewleta Tirk a ku hertim behsa ewlehiya xwe dike li ku derê bû dema çeteyên DAIŞ’ê xeta sînor dagir kiribû?, Niha piştî ku bi saya QSD’ê herêm ewle bûye, Tirkiyê dixwaze aramiya wê bihejîne. Em Tirkiyê wek êrîşkar û dagirker li ser xaka me dibînin.”
Di dawiya civînê de şêx û rûspiyên êlên Reqayê teqez kirin ku ew piştgiriya QSD’ê dikin…*ANHA*

## Namzetî û pêşbaziyê demokratîk



Tayîp TEMEL

Gelên ku ji bo azadiyê dijîn û têdikoşin hertim di rewşên awarte de jiyana xwe didomîn in. Ji bo têkoşêran her roj ji roja din girîngtire û divê ku jiyan li ser serkeftina bê avakirin. Kurd jî bi taybetî di 30-40 salên dawî de hertim di demên nazik de derbasbûn û hin jî dibin.
Di vê merheleyê de jî kurd bi gelek ceribandin û azmûnan re rû bi rû ne. Her geşedanek hêz, bawerî, îradeya gelê kurd dipîve. Her wiha gelê kurd di demên pir xeter û dîrokî de hêza xwe da nîşan. Lewma îro kurd di qada navnetewî de di navenda geşedanên ku dengeyên cîhanê digurin de cîh digirin. Ev yek ji bo gelê kurd bi qasê talûkeyên mezin firsend û derfetên mezin jî di hewîne. Bê gûman geşedanên li çar parçeyên Kurdistanê pir girîng in û divê ku bên nirxandin. Lê belê em di pêvajoya hilbijartinê de derbas dibin û em hemû neçarin ku encamek li ser van geşedanên heremî û Tirkiyeyê bike derxînin holê.
Pêvajoyên hilbijartinê pêvajoya xizmetê ne. Her welatparêzek, têkoşêrek, kesên azadîxwaz di demên wiha de wekî berpirsiyariyek xizmet û xebata têkoşîna gel bibin namzet. Ev nîşaneya berdewama kar û xebatan e û ji bo partiye me jî kêfxweşiyek mezin e. Di vê warê de pêşbaziya di navbera berendaman de pêşbaziya xizmetê ye. Bê gûman pîvanên vê yekê hene. Di her rewşên wiha de ji bo şarederiyê gelek kes serîldan dikin lê belê kêm kes dibin namzet. Partiya me vê carê biryar da ku namzetên xwe bi hilbijartina bi beşdarbûna gel diyar bike. Her deverek dê namzetê xwe diyar bike. Zihmet be jî biryara gel esas e û riya herî demokratîk e. Gelê jî di vê ferasetê de ku her berendamekî me dikare bibe namzet. Di vê warê de her hevalekî me dikare ji bo namzetiyê heya dawî xebatê xwe bimeşîne. Lê piştê ku namzet hatin diyarkirin divê ku hemû berendam, gelê me li derdora vê namzetê bibin yek ji bo serkeftina partiyê xebat bimeşîn in. Piştê ku namzet hatin diyarkirin niqaş û lêgerînên cûda divê bi dawî bibin.
Ev hilbijartin di navbera xeta serdestiyê û azadiyê tê lidarxistin. Mesele ne ewe kê dê kê/î bibe namzet. Mesele ewe ku dê kîjan xet bi ser bikeve. Tu fikare me tune ye ku her hevalekî me û berendamên me dê li gor vê hişmendî û hesasiyetê tevbigere. Ne xwe piştê ku namzet hatin diyarkirin lêgerînên cûda hesabên şexsî ne. Piştê ku namzet hatin diyarkirin divê tu berendam xwe venekişînin, nekevin nav lêgerînek cûda.
Em di vê hilbijartinê de tenê şaredaran diyar nakin. Di heman demê de gelê me dê li hemberî politikaya êrişkariyê, tûnekirina gelê kurd îradeya xwe diyar bikin. Dê tercîh û hilbijartinên me li hemberî lêgerîna dagirkirina Rojava bibe bersiv. Dê helwesta me ji lîstikên navneteweyî re bibe peyam. Niha çavê dinyayê li ser gelê kurd e. Hêviya gelên bindest jî têkoşîna gelê kurd e. Lewma di vê merheleya dîroka de ji bi serkeftinê ji bilî şoreşê tû çareyek gelekî kurd nîne. Berendamên me û namzetên me yên ku ji bo xizmeta vê gelê derketine rê jî dê di vê hişmendiyê de tevbigerin. Hemû derfetên serkeftinên mezin hene, tenê divê em pêwistiya vê yekê bi cîh bîn in.
Bêguman hevalên me hêja ne, namzetên me girîng in. Lê ya herî girîng azadiya gelê me ye, serkeftina vê têkoşînê ye.



# Xwe ji bo qonaxeke nû amade bikin

**Komuna Enternasyonalîst a Rojava bi daxuyaniyekê ragihand ku dewleta Tirk a faşîst û hevalbendên wê gefa êrîşeke nû li gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyê dixwin û diyar kir ku wê bi gel re li ber êrîşên faşîst rabin û bang li her kesî kir ku xwe ji bo berxwedan û qonaxeke nû ya têkoşînê amade bikin.**




Komuna Enternasyonalîst a Rojava diyar kir ku wê bi gel re li ber êrîşên faşîst rabin û bang li her kesî kir ku xwe ji bo berxwedan û qonaxeke nû ya têkoşînê amade bikin.
Komuna Enternasyonalîst a Rojava bi daxuyaniyekê ragihand ku dewleta Tirk a faşîst û hevalbendên wê yên Îslamîst gefa êrîşeke nû li gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyê dixwin û û diyar kir, gefên nû yên Erdogan ên ji bo dagirkeriyê, “îlana vekirî ya şerê tinekirinê” ye.
Komunê bi bîr xist, ji destpêka şoreşê û vir ve dewleta Tirk, rejîma Sûriyê û hêzên emperyalîst ên bi serkêşiya Dewletên Yekbûyî yên Emerîka (DYE) û Rûsyayê, ji bo şoreşê qels bikin çi ji destê wan hat kirin.

### EM PIŞTA XWE BI KESÎ GERM NAKIN

Di daxuyaniyê de ji bo Rojava hate gotin, “Mînaka berbiçav û zindî ye ku di sedsala 21’ê de afirandina cîhaneke din pêkan e” û işaret bi dagirkirina Efrînê hate kirin ku bi bombeyên NATO’yê û tankên Elman hate dagirkirin.
Di daxuyaniyê de hate gotin, “Mirovên li vir û me jî ji Efrînê ev yek fêhm kir: “Ji bilî hêza xwe divê em pişta xwe bi kesî germ nekin. Baweriya me qet bi daxuxyaniyên hêzên navneteweyî nayê û em ê serî li kesî jî nedin.”

### BERXWEDANEKE NÛ

Daxuyaniya Komuna Enternasyonalîst wiha dewam kir: “Em bang li her kesî dikin ku xwe ji bo berxwedaneke nû, xwe ji bo qonaxa nû ya têkoşînê amade bikin. Eger yên ku li dijî şoreşê şer dikin hêzên navneteweyî bin, wê çaxê berxwedana me jî wê bi vî rengî be. Werin em nîşanî her kesî bidin ku ev şoreş şerê me hemûyan e, Rojava hêviya me hemûyan e û raxin pêş çavan ku em ê paşeroja xwe bi hev re biparêzin.”
Komuna Enternasyonalîst ragihand, ne tiştekî tesadûfî ye ku di vê qonaxê de êrîş were kirin û got, “Li dijî êrîşên modernîteya kapîtalîst, gelekî girîng e ku li her derê serhildan û parastina moderniteya demokratîk were kirin.”

### QONAXEKE NÛ DEST PÊ DIKE

Komuna Enternasyonalîst a Rojava diyar kir ku ji niha û pê ve ji bo wan qonaxeke nû dest pê dike û wiha dewam kir:
“Ji bo saziyên sivîl ên vê şoreşê destek bikin, wan fêhm bikin û bi pêş ve bibin, em li hev civiyan. Dixwazin vî şerî bi zorê li me û gelê Rojava bidin qebûlkirin. Lê belê eger dijmin alternatîfeke din ji me re nehêle, em ê jî xwe nedin alî. Em ê bi hemû hêza xwe şoreşê û civakê biparêzin. Ji deverên cuda yên cîhanê em bi nêrîn û tecrûbeyên cuda li hev civiyan, lê ev xak ji bo me bû mal. Em ê bi vî ruhî tevlî seferberiya giştî ya civakî bibin ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê roja 12’ê Kanûnê ragihand.
Hûn jî li gel şoreşê cih bigirin, dengê xwe bilind bikin, li kolanan li hev bicivin, komîteyên piştevaniyê û komên berxwedanê xurt bikin û yên nû ava bikin.
Ji bo balê bikişînin ser rewşa li Rojava, dest bi çalakiyên bê îteatiya sivîl bikin û bi awayekî vekirî piştgiriya xwe nîşan bidin.”

## 22 endamên Kongreyê nameyek ji Trump re şand



22 endamên Kongreya Amerîkayê nameyek ji serokê Amerîkayê Donald Trump re şand û îşaret bi xalên girîng ên biryara vekişandina hêzên Amerîkayê ji Sûriyê kir.
Di nameyê de wiha tê gotin:
“Em vê nameyê ji te re dişînin da ku em hişyariyê derbarê vekişîna hêzên leşkerî ji Sûriyê de bidin. Divê şîroveyek ji aliyê wezîr Mattis û şêwirmendê ewlehiya niştîmanî Bolton derbarê vê biryarê de di zûtirîn demê de were xwestin.
Em bi te re ne ku Amerîka ne polêsê cîhanê ye. Divê tev li tu şerên bêdawî, vekirî û bêarmanc nebe. Em der barê biryara vekişîna hêzên leşkerî de bi tirs in ku wê zirarê bide berjewendiyên Amerîkayê li herêmê. Em di nava metirsiyan de ne ku wê vekişîna hêzên leşkerî ji Sûriyê, zirarê li hevalbendên me Kurdan bike.
Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi artêşa Amerîkayê re li dijî rêxistina îslamî dema ku tu kesî li herêmê ev yek nedikir û nikaribûn bikin, şer kir.
Em di rewşeke wisa hesas de, piştî wan ku bi canê xwe dijminekî hevbeş têk bir, dev ji wan bernadin. Ev yek wê bidestxistina hevalbendan di demên pêş de asteng bike û wê hemû destkeftiyên me yên mezin ku me li dijî DAIŞ`ê bi dest xistine , bixe xetereyê.
Her wiha em der barê xwestekên Îran, Tirkiyê û Rûsyayê de ku aramî û ewlehiya Sûriyê tevlihev dikin, di nava metirsiyan de ne.
Diyar e ku serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan haziriyên dagirkirina Bakurê Sûriyê dike. Dixwaze di operasyonên xwe de hevalbendên me Kurdan tune bikin.
Îran wê bikaranîna başûrê Sûriyê wek korîdorekê di navbera Tehran û hêzên Hizbullahê de berdewam bike. Baweriya Rûsyayê heye ku tev li hemû çalakiyên ku zirarê bigihîne berjeweniyên Amerîkayê. Heger Amerîka di zûtirîn demê de xwe vekişîne, wê valahiyek di Rojhilata Navîn de çêbe. Ev valahî wê tevlihevî û şerekî mezin li herêmê çêke. Ev yek jî wê careke din DAIŞ û El-Qaîdeyê vejîne.
Bi kurtasî em der barê dema vekişîna hêzên Amerîkayê de bi tirs in. Em dixwazin di zûtirîn demê de nêrîna we ya girîng der barê vê biryarê de bigirin. Em li hêviya bersiva we ne.”…*ANHA*

## Gelê Şengalê xwest ku gorên komî werin vekirin





Şengaliyan diyar kirin heta niha 74 gorên komî yên Êzîdiyan li Şengalê û derdorê hatine dîtin, lê heta niha hikumeta Iraqê bi şêweyekî fermî dest bi vekirina gorên komî nekiriye.
Piştî Fermana 3’yê Tebaxa 2014’an ya çeteyên DAÎŞ’ê li Şengalê komkojiyeke mezin pêk hat. Li gor agahiyên Şengalîyan heta niha 74 gorên komî hatine dîtin. Li gel ku Serokê Desteya Mafên Mirovan yê Iraqî Elî Ebdi Al kerîm 11’ê Cotmehê gotibû ew ê li ser gorên komî yên Şengalê lêkolînê bikin û gorên ku hatine dîtin vekin jî heta niha ti hewldanên piratîkî nehatiye kirin. Şengalî jî daxwaz ji Hikûmetê û Desteya Mafên Mirovan a Îraqê dikin ku bi berpirsyariya xwe rabin û soza vekirina gorên komî bi cih bînin.
Dayîka bi navê Neam Bedel têkilî mijarê axivî û got, ‘’Ev 5 sal di ser fermanê re çûn, gelek gorên komî li Şengalê û derdora wê hene. Lê heta niha Hikûmeta Îraqê bêdeng e. Gelê Şengalê li hêviya hestiyên xwe ne lê hikûmet karê xwe nake.’’
Neam bi berdewamî got, ‘’Hewce ye ku Hikûmeta Îraqê Komîteyeke Tenduristî a taybet ava bike û gorên komî werin vekirin. Ev ji 2 salan zêdetir e ku Şengal azad bûye lê he jî ev gorên komî nehatine vekirin.’’
Neam her wiha got dewleta Iraqê wan bi rengê Iraqiyan nabîne, welatîbûna wan qebûl dike û heke ew welatîbûna wan qebûl dike divê daxwazên wan jî werin bicihanîn. Neam diyar kir divê gorên komî werin vekirin, xwest ku hêzên navdewletî û saziyên mafê mirovan, li ser mafê Êzidiyên rawestin.
Neam têkilî êrîşên Tirkiyê yên li ser Şengalê jî got heke hikûmeta Iraqê Şengalê parçeyek ji Iraqê dibîne divê pêşî li êrîşên dagirker ên Tirk bigire.
Ciwana bi navê Lozîne Silêman jî ji hikûmeta Iraqê xwest ku gorên wan ên komî werin vekirin, gorên wan ev 5 sal in li ber germa û baranê ne, divê hikûmeta Iraqê bi peywira xwe rabe û wan gorên komî veke. Silêman got, ‘’Em naxwazin şehîdên me, şehîdên Êzidxanê winda bibin û divê mafê wan were dayin.”...*ANF*

## Pirsgirêka Kurd a DYA’yê



Burhan ERDEM

Biryara Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya vekişîna ji Sûriyeyê bi xwe re pirsgirêkan tîne. Yek ji van pirsgirêkan jî ew e ku Amerîkî nû pê hesiyan e. Ev pirsgirêk jî ewa ku bi salan e her di devan de ye. Pirsgirêka Kurd! Ev pirsgirêk demeke dirêj tenê ya Iraqê, Sûriyeyê, Îranê û herî zêde jî pirsgirêka Tirkiyeyê bû. Lê dewletên daxilî xwedêtiya vê pirsgirêkê jî bûne, vê dawiyê çêbûbûn. Weke Almanyayê. Ji sala 1993yan ve ye bi biryara qedexekirina faaliyetên PKKê re Almanya jî bûbû xwediya pirsgirêka Kurd. Lê tucarî nedihate bîra kesî ku wê rojekê ew dewleta mezin ali pişt deryayan û jendermeya cîhana me jî bibe xwediya pirsgirêka kurd. Lê ew jî bû. Belê îro Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî bûye xwediya Pirsgirêka Kurd!
Sedema vê yekê wê biryara Serokê DYAyê Donald Trump a vekişîna leşkerên xwe yên ji Rojava û Bakurê Sûriyeyê ye. Di demekê de ku kesî bawer nedikir tiştekî wiha bike, Trump rabû ev biryar da. Siyaseta navxweyî ya amerîkî pê re hejiya. Hewldan wî qanih bikin. Giregirên di kabîneya wî de pê re rûniştin da ku wî ji vê biryarê vegerînin. Dîtin ku nabe, rabûn îstifa kirin. Çimaniya van îstifayan jî ew bû ku dixwestin kurdan bi tenê nehêlin. Lewra dijminê wan î sondxwarî Serokomarê Tirk Recep Tayîp Erdogan bi eşkereyî li wan kurdan gef xwaribû. Gotibû ewê Rojava û Bakurê Sûrî îşgal bike. Webala vekişînê ya piştî vê gefê gelekî zêde bû. Xeynî rêveberên Washingtonê jî, birek siyasetmedarên xwedî giranî, rabûn li dij derketin.
Niha li nava Amerîkiyan gelek pirs tên kirin. Dibêjin ka armanca me li Sûriyeyê veguherîna rejîmê bû, ka têkoşîna bi DAIŞ’ê re û dîsa hêzên dişibine wê bû, emê çawa vê qadê ji vê rejîmê re bihêlin ku ewqasî di bin tesîra Îran û Rûsyayê de ye û di ser re jî emê wan mutefîkkên xwe yên bi leşkerên me re şehîd bûne, li hemberî van gefên Erdoganê dîktator bi tenê bihêlin. Mutlaka wekî din jî pirs hene, lê ya ku ew amerîkî gelekî pê diêşin ev a dawiyê ye.
Xweş xuyaye ku bi vî awayî derketina ji sûriyeyê wê tucarî ne bi dilê Amerîkiyan be. Lewra xeynî têkoşîna li hemberî DAIŞê jî, di warê rêlbergirtina Îranû Sûriyeyê de jî hebûna Rojava û pêve girêdayî herêmên Bakurê Sûrî, ji bo DYAyê fersendek bê. Li vê qada ku kontrola rejîma Şamê naxwaze DYAyê dikaribû karên di çarçoveya vê stratejiya xwe de bi hêsanî bike. Li vêderê ku dewlemendiya ser erd û bin erdê heye, wê Amerîkiyan nexwestiba ew rêveberiya Şamê ya di bin kontrola Rûsya û Îranê de xwe lê serdest bike. Li aliyê dinê, ji bo qanihkirina Tirkiyeyê jî gelek qert di destê Washîngtonê de ne hebûn ku bi demê re karibû derxe pêşiya rêveberiya Enqerê.
Êdî herkes ji roja pênşemê ve ye ku ev biryar hatiye eşkerekirin van pirsan dipirse; çima ev surprîza hanê? Wê Tirkiye çawa êriş bike? Û ji hertiştî jî girîngtir; wê rewşa Kurdan çawa be? Gelek şîrove û analîz hene ku ji gelek aliyan ve bersiva van pirsan didin. Ji vana hemûyan jî xuya dibe ku êdî Amerîkî bûne xwediyê wê pirsgirêka temen dirêj; Pirsgirêka Kurd!